

Beyana PDK-Bakur derbarê Ergenekonê

PDK-Bakur derbarê Ergenekonê û derdestkiriyên vê dawiyê daxuyaniyek da (09.01.2009). Hûkumetê ji ber vî karî pîroz kir û daxwaza berdewamiya vê dawiyê kir. PDK-Bakur dixwaze ku Kurdên nav Ergenekonê jî werin kifşkirin û girtin û derbikevin pêş mahkemeyê. Hemî teksta daxuyaniyê li jêr e:

QELSKIRIN Û DAWÎLÊANÎNA ERGENEKONÊ DÊ BIBE SERKEVTINEKA HÊZÊN DEMOKRAT, LIBERAL Û AZADÎXWAZ

Van sê rojên dawî piştî girtina zêdetirî çil kesên bi Ergenekonê ve peywendîdar, mijara rêxistina terorist ya bi navê Ergenekonê careka din rojeva siyasî ya Tirkîyeyê dagirt. Medya Tirkîyeyê û dezgehên birêvebirî û dadyerî hemî bi vê pirsê ve mijûl in. Tirkîye bi mijara Ergenekonê radibe û radize. Dezgehên nav dewletê ji hevdu aciz bûne, bi tirs û xof hevdu dişopînin. Hinekî rojnamevan di nîrxandinên xwe de dipirsi, 'dewlet dijî dewletê kar dike!'. Rayedarên Tirk vê rewşa xwe di rû û rûçikê xwe de didin xuya kirin. Bi taybetî di wêneyên serfermandarê leşkerî Orgeneral İlker Basbug de, ev yek gelek bi zelaî xuya dike. Qîreqîr û zarîna serokê partiya kemalist Deniz Baykal, tîne bîra mirovî ku ew bixwe lê hesiyane duvikê wan jî gihaye agir.

Berî mehekî ku li Silîvreyê dawa Ergenekonê dest pê kir, şik û guman peyda bûn ku dê ew dawê bi cureyekî ji bala raya giştî were bi dûrxistin û wisa hêdî hêdî were jibîrkirin. Lê bi tewqîfatên berî sê rojan, bi taybetî binçavkirina hin generalan, yekî wekî Tuncer Kilinç, ji bo hêzên liberal û demokrat hêviyên nû peyda bû ku dê pîrsa Ergenekonê ser neyê girtin. Hemî hêzên azadî û aşîtxwaz hewce ye vê mijarê hertim bişopînin û nehêlin ku ev pîrs beravêtî bibe.

Partiya me, PDK-Bakur, ehemiyeteke zêde dide vê pirsê û bi hemî imkanên xwe dixwaze çavderiya mijarê bike. Pîrsa rêxistina terorist Ergenekonê li Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê pîrseke sereke ya prosesa demokrasîyê ye. Bê ku piştî vê cinawerî neyê şikestin, ev rêxistin neyê belavkirin, li Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê aşîtî û aramî cîbecîh nabe. Hemî hêzên demokrat û pêşverû pêwîst e, di vê mijarê de hevkarî û hevpeymanîyekî bikin, da ku ev proses ji bo bihêz kirina aşîtî û aramiya herêmê û her wisa ji bo berjewendiya gêlên Tirkîyeyê û Kurdistanê bi pêşkeve.

Em, Hukumeta AKPê û dam û dezgehên ku pişka wan di vî karî de heye pîroz dikin û bangê li hemî hêzên welatparêzên Kurd û hêzên pêşverû yê Tirkîyeyê dikin ku bibin çavdêrên vê prosesê û her wisa piştgir û alîkarê vî karî. Qelskirin û dawîlêanîna gladyoya Tirk dê rê li ber demokrasîyê û prosesa endametiya Yekitiya Ewrûpayê vebike.

Ergenekon, ne tenê di nav Tirkan de bi rêxistinî ye; her wisa di nav Kurdan de jî hêza xwe heye û destê wan di nav gelek bûyeran de ye û desttêwerdanên wan her berdewam in. Hêzên ku nahêlin li bakurê Kurdistanê aşîtî û aramî peyda bibe, dawî li şer û xwînê were, ev hêz bixwe ne. Bêhêzkirina ergenekonê her wisa di nav Kurdan de dê rê li prosesa nermayîyê û aşîtiyê veke. PDK-Bakur vê yekê dixwaze û lê dixebite. Di vî warî de hewce ye, tevgera bakurê Kurdistanê piştgirê Serokatiya Kurdistanê azad bibe.

PDK-Bakur, piştgirê ronîkirina pîrsa Ergenekonê ye û daxwaz dike ku ev hewldan her berdewam bin heta ev rêxistin bi temamî were aşkere kirin û jihevduxistin ku nikaribe careka din çalak bibe. Derfet û vijyan û hêza biryarê di destê hukumetê de ye, hewce ye ev îrade werê bi karanîn. Hemî hêzên pêşverû divê amadeyê alîkariyê û piştgiriya bin.